Bilzak

Napelyonê edebiyata firensî

Wergêran ji erebî / Daêva

Onurêh Bilzak romannvîsek firensî ye sedî sed. Gava ku rexnegirek li ser kar û berhemên wî rabiweste, weha dibêje.

Li sala 1799- hatiye vê jiyanê ji bo ku romanê binivîse herwek ku ew bi xwe bawer dike. Li gorî wê baweriyê dest pê dike û berhemên bedew li pey xwe dihêle heya ku digehe dawiyê, ew jî li sala 1850-yê bû.

Di demek zû de behreya nivîsê li cem wî xuya dibe. Bavê wî dixwazt ku ew yasazaniyê bixwîne ji bo ku bibe avokat yan dadwer. Belê Bilzakî bi xwe ew yek nedivya û bêhtir ji carekê hewl da bavê xwe têbigehîne ku ew behredar e û dikare di bar û biyavek din de efrandinê bike. bavê wî zû dihê rayê û dihêle ku Bilzak bi xwe birayara çarenivîs û dahatûyê xwe bide.

Hêj nebûye bîst û şeş sal, heta şeş romanan nivîsî belê nedixwazt navê xwe li ser binivîse. Yekem romana ku navê xwe li ser nivîsî, romana " Şorişvan " bû, ew jî derbarê şorişa firensî û heyamên guhorînê bû.

Bilzak berdewam dibe û bêhtir dinivîse. Di barê romanê de efrandinên mezin dike heya ku karek yekcar mezin pêşkêşî xwandevanan dike, ne tenê li firensa belê li cîhanê hemûyê. Çav li nivîskar Dantî dike û zincîre romanan bi navê " Komedyaya mirovane" amade dike. Komedyaya mirovane, di navbera salên 1831- 1842-yê de nivîsand û ji 79 romanan pêk hîna û tê de hewl da ku civakê mirovayiyê wek xwe pêşkêş bike. Heya sê sed kesayetiyan bi kar hîna û her kesayetiyek di zat û derbirînên xwe de serbixwe bû. Tiştê here taybet di " Komedyaya mirovane " de ew e, ku hemû roman wek zincîre karek hevtevav û berdar û hevgirtî ye, belê her romanek jî dikare bi tena xwe bihê xwandin û wergirtin, ango karek edebî serbixwe ye bo nimûne romana "Goryo yê Bav" ya ku li sala 1835-ê çap bûyî.

Bilzakî gelek dinivîsî. Hindek caran heya 18 seetan di rojê de dinivîsî û her romanek jî wî bi xwe pêdeçûn û rastkirina wê dikir. Di demê nivîsîna romanê de, tenê qehwe vedixwar û car car hindek mêwe dixwar ji bo ku bikare berdewam bibe çunkî bawer dikir ku temen têra nivîsê nake. Ew, ne wek her mirovek din bû. Têr nedixwar û venedixwar. Bi her tiştê xwe ji yên din cuda bû heya wê radeyê ku bû cihê pirs û têbîniyên derdora xwe. Reftar û moralê wî jî bibû cihê rexneyan belê gelek kesan jî piştgêriya wî dikir ji ber ku buhayê kar û edebiyata wî dizanîn.

Wî karî derbirîna here rasteqîne bo civakê firensî di serdemê xwe de bike û rastî û nerastiya hemûyan da naskirin. Ji bilî romanê wî xwazt hindek janrên din yên edebiyatê binivîse wek gotar û şano û hindek caran hewl dida biyavê rojnamegeriyê jî ji bo peyvê bi kar bihîne.

Bilzak mirovek xwedî tirxan û helwîst bû. Dixwazt wek xwe jiyana xwe biborîne bêyî ku bihêle kiryar û helwîstên civakê bandorê bigehînin jiyan û edebiyata wî. Dizanî hejarî û perîşanî çî ye, dizanî têr û kedxwedayî jî çî ye. Piştî wan karên mezin maf da xwe ku hindek şanaziyê bi xwe bibe û berhemdana xwe pesend bike lewra jî digot:" Ez Napelyonê edebiyata firensî me!".

Hêza Bilzakî di edebiyatê de bû, hêza edebiyata wî di fantaziya û derbirînê de bû, hêza fantaziya û derbirînê di peyvê de bû lewra jî berdewam digot:" Xwezî her kesê wek pêdivî peyv naskiriba, ku ne tenê ji tîpan, belê ji ruh, deng û wateyê pêk dihê!".

Jêder : Pirtûka (Navdarên ku dîrok guhorîn) ya nivîskar Ehmed Şenwanî